HOMES ZONE

Nûçe ji bo we
ji Homes for Haringey

Kurdish

Homes Zone, kovara nuh a Homes for Haringey ji bo kirêdar û xwedî-lease'an e.
Ew dewsa Tenant Star digire.
Em hêvî dikin ku hun ê jê hez bikin.

4 Nûçe

6 Desteya we

7 Banga we

8 Nişteçî Lêkolîn: encam

10 Tevlêbûn

12 Rûpela Pam a probleman

û bêtir...

£50

Fîş
li benda we ye
binêrin rûpel **14**

Lêkolîna nişteçî:
We ji bo me çi got...

Nameya Edîtor

Bixêr hatin

bo kovara me ya nipînû bo nişteciyan. Me li ser ku divê xuyabûna kovarê çawa be û çîrokên ku hun dixwazin bibînin, nêrînên we jî li pêş çav girtine. Li ser daxwaza we em ê Homes Zone salê çar caran biweşînin, da ku li ser xebata Homes for Haringey nûçeyên dawî bigihînin we.

Têde bibînin ku li gora nişteciyên ku tev li lêkolîna me ya salane bûne em çi baş dikin û divê em çi çêtir bikin. Bibînin ku Michael Jones, serokê desteya birêvebirên Homes for Haringey çawa plan dike ku soza me ya xizmetên çêtir bicîh bîne. Û bibînin ku çima Martin Laheenê xwedî-lease difikire ku hêjayî tevlêbûna nişteciyan e.

Em hêvî dikin ku Homes Zone bi dilê we be. Heke hun difkirin ku em dikanin wê çêtir bikin, an jî dixwazin ku tev li panela xwendevanên me bibin, ji kerema xwe li navnîşana jorîn têkilî çêbikin.

Rêz û silab, **Katie Matthews**, Edîtor

Lêkolîna Nişteciyan:

Alîkarîya me ya pêkanîna wêneyekî awayê performansa me bikin.

Dawîya sala çûyî, fîrmayeke serbixwe ya lêkolîna marketê hevpeyvîn bi hejmarek nişteciyên re çêkir ku bibîne ku xizmetên ku em pêşkêş dikin bi dilê we ne an na. (Encaman li rûpel 8 bixwînin).

Lê belê, hikûmet bi hewes e ku bizanibe ku em pêwîstîyên gelê Haringey bicîh tînin an na û ku em li hemberî sazîyên wek xwe li seranserî welêt di çi derecê de ne.

Ji bo ku em bikanibin agahîya pêwîst pêşkêş bikin, divê em lêkolîneke din pêk bînin.

Di Hezîranê de, bi qasî 6000 nişteciyên bi korfelaqî ji bo tevlêbûnê hilbijartî dê bi postê pirsnameyekê bistînin. Heke hun hatibin hilbijartin, ji kerema xwe ji bo bersîvkirina pirsan demê veqetînin û formê bi şûn ve ji me re bişînin.

Heke hun pirsnameyeke lêkolînê bistînin, ji kerema xwe pirsan bersîv bikin û formê li me vegerînin. Sipas.

salnameya pêvekirî ji bo şopandina dayinên kirêya xwe bikar bînin – ji bo kitkitan li rûpel 5 binêrin.

Em dixwazin ji we bibihîzin

Li ser Homes for Haringey tiştekî ku hun bibêjin heye? Ji me re bibêjin.

Telefon: 020 8489 4487

Email: communications@homesforharingey.org

Binivîsin: Communications Team, Homes for Haringey, 13 - 27 Station Road, London N22 6UW

Xanîyên Minasib

Divê Homes for Haringey ji bo pereyê zêde serî li hikûmetê bide ku heta 2010an xanîyan bîne standarda Xanîyên Minasib. Ango divê li hemû xanîyan metbax û serşokeke bi awayekî maqûl modern hebe, bi awayekî minasib bên germkirin, û di rewşeke baş a tamîrê de bin.

Berî ku Hikûmet peran bide me, divê em îspat bikin ku em dikanin xizmeteke baş bidin we, mişterîyên xwe. Ango divê em rêjeyeke du stêrk ji Komîsyona Kontrola Hesaban bistînin.

Îsal di Sibatê de, me teftîşeke ceribandinî dît; xuya bû ku hinek tişt çêtir dibin. Bêtir jêxweşbûna kirêdar û xwedî-lease, çêtir xwe gîhandina xizmetan, û bêtir derfetên tevlêbûna nişteciyan di nav de bûn.

Lê belê şûnve agahîdayina teftîşê her weha xuya kir ku di hin qadan de çêtirkirin pêwîst in. Ji bo ku bêtir dema ji me re ji bo anîna hemû xizmetên me bo standarda du stêrk pêwîst bidin me, me teftîşa sereke ji Çileyê Pêşîn 2006 bo Bihara 2007an bi derengî xist. Ji bo ku em pereyê zêde yê ku ji bo em bernameya xwe ya çêtirkirinê pêk bînin ji me re pêwîst e bistînin, divê em di vê teftîşê de du stêrkan bidest bixin.

Heke hun li ser ku hun dikanin çawa alîkarîya Homes for Haringey bikin, da ku xizmetên ku hun dixwazin pêşkêş bike, bêtir agahî dixwazin, ji kerema xwe li gel fîma Tevlêbûna Nişteciî li 020 8489 4463 têkilî çêbikin, an bi email: resident.involvement @homesforharingey.org

Bi Qasî Gepekê

Homes for Haringey

Homes for Haringey nuha ji birêvebirina xanîyê we berpirsiyar e. Şaredarîya Haringey hîn jî xwedîyê xanîyan e û xwedîyê xanîyê we ye.

Mîsyona me ji bo pêşkêşkirina xizmetên xanî yên bi kalîte û xanîyên minasib bi nişteciyan re xebat e.

Ji bo bêtir agahîya li ser Homes for Haringey, biçin www.homesforharingey.org

Civînên Desteya Birêvebir ji hemûyan re vekirî ne

Desteya Birêvebir a Homes for Haringey bi rêzdarî dicive. Hemû civîn ji gel re vekirî ne. Tarîxên civînan ji pêş ve di rojnameyên herêmî de û li websîteya me tên daxuyanî kirin: www.homesforharingey.org

Ji bo bêtir agahîya bi Tîma Birêvebirîya Homes for Haringey re li 020 8489 1407 têkilî çêbikin.

Hun dixwazin **websîteyan** seh bikin, lê komputereke we tune? Li pirtûkxaneya herêma xwe **Înternetê bêpere bikar bînin**

Xanîyên germtir bi mesrefê kêmtir ....

Em her sal bêtirî xezar xanîyan însûle dikin ku wan germtir û germkirinê erzantir bikin.

Nuha divê em bizanibin ku di pêşkêşkirina vê xizmetê de em çiqasî baş in. Ji me re bibêjin ku em çi baş dikin û em dikanin çi çêtir bikin.

Ji kerema xwe bi Gamini Jayasinghe re li 020 8489 1018 têkilî çêbikin.

Gamini.Jayasinghe@homesforharingey.org

Nûçe

Sehkirinên ewlebûna gazê: bihêlin em têkevin hundir, an na hun ê mesrefên hiqûqî bidin



Dadgehê biryar da ku kirêdarek £400 mesrefên hiqûqî bide, ji ber ku nehiştibû ku li mala wê sehkirinên ewlebûna gazê yên jîyanî bên pêkanîn.

Ji bo ku karê pêwîst bikin, mihendîsan çar randevû saz kiribûn, lê nikanîbûn têkevin xênî. Homes for Haringey mecbûr ma ku li gel dadgehê dozê li kirêdar veke.

Kirêdarê li rûniştina dadgehê got ku ew çend mehan li xênî nemaye û lawê wê name ji wê re neşandine. Wê dûre amadekarî kir ku mihendîs ji bo sehkirina gazê têkevin xênî; ji lew re wê carê pêwîst nebû ku Homes for Haringey bêtir tedbîrên hiqûqî bistîne. Lê belê heke bêtir tedbîrên hiqûqî pêwîst bibûya, dibû ku kirêdar bi bêtirî £1,000 mesrefan rûbirû bibûya.

Qanûn dibêje ku divê Homes for Haringey qet nebe salê carekê sehkirina ewlebûna gazê pêk bîne. Peymana we ya kirêdarîyê dibêje ku divê hun 'bihêlin ku em têkevin xênî da ku her sal sehkirinên ewlebûnê û her teftîşeke pêwîst bikin'.

Heke hun nameyeke bi randevûyeke ji bo hatina mihendîs bistinin, divê kesek li wir be ku wan têxe hundir, an jî divê hun telefon bikin û tarîxeke din veqetînin.

Ji bo hemû kirêdarên şaredarîyê her sal sehkirina boiler bêpere ye û dikane jîyanan biparêze. Her sal li Brîtanya 50 mirov ji jahrdayî bûna karbon monoksîdê an jî teqînên ji ber pêwengên xerabe yên gazê dimirin.

Îzehkirina stêrkan

Şaredarîya Haringey sê stêrk hene. Homes for Haringey divê du stêrkan bidest bixe. Serê we tevlihev bû? Ne tenê yê we.

Her sal nahtorê Hikûmetê, Komîsyona Kontrola Hesaban hemû şaredarîyan teftîş dike û ji her yekê re rêjeyeke stêrkan dide: stêrk tunebe, ew tê wateya performansa xerab û çar stêrk tê wê wateyê ku ew heta ku dibe baş in.

Daxuyanîya dawî ya ku sê stêrk dane Şaredarîya Haringey ji bo her kesî nûçeyeke baş e. Ew tê wê wateyê ku şaredarî bi giştî xizmeteke çêtir dide nîştecîyan.

Di Bihara 2007an de, Komîsyona Kontrola Hesaban dê sehkirineke cûda li sazîya nuh a Arms Length Management Organisation (ALMO) a Homes for Haringey bike, ev sazî xanîyên şaredarîyê birêve dibe.

Ji bo bidestxistina pereyê zêde yê hikûmetê ku ji bo bicîhanîna bernameya me ya Xanîyên Minasib ji me re pêwîst e, divê Homes for Haringey qet nebe du stêrkan bidest bixe. Ji bo ku ev bicîh were em pir dixebitin.

Heke hun bêtir agahî dixwazin, ji kerema xwe li 020 8489 1407 bi me re têkilî çêbikin.

Li dijî şêlên antî-sosyal biser ketin

Nişteciyên Lomond Close û Brunswick Road li South Tottenham li sîteya xwe dizîya ereban û firotina narkotîkan di nav de bi yelpazeyek şêlên antî-sosyal mijûl bûn.

Xebata wan a hêja ji wan re xelata Projeya Herî Baş a Ewlekarîya Civakê ji alîyê Şaredarîya Haringey û xelateke Wezareta Karên Hundir 'Li Hember Sekinîn' anîn.

Eric Cook, Sekreter û Qasedarê Komela Nişteciyan weha got: "Sîte nuha cîhekî xweştir ê lêmayinê ye. Ronahîkirina çêtirkirî û derîyên ewlekirî cûdahîyeke rast li civakê çêkir. Bendên li kêleka parka ereban pêşî lê girt ku mirov lê bigerin û bi dengezarî, muzîk, avêtina gemarê û qûmarê nereheîyan çêbikin."

"Li malê rûniştin û gazinên pirsgirêkan kirin bikêrî tiştekî nayê; tenê rêyek heye ku meriv tiştan bide kirin, ew jî çalakbûn e."

Di dayina xelatê de, Cllr Isidoros Diakides, endamê birêvebir ê daîra Xanîyan weha got: "Van kesên nişteciî biryar dan ku li hember bisekinin û ji bo mafên xwe têkoşîn kirin. Herêm yekcar çêtir kirin."

Eric Cook û Endamê Encumaenê Diakides di merasîma xelatan de

Mijarên Perwerda Kar!

Me li xwe girtiye ku nişteciyan teşwîk bikin ku tev lê bibin û li ser awayê ku em Homes for Haringey birêve dibin gotina xwe bikin.

Perwerda kar a rast dikane bibe alîkar ku zîrektî û zanîna we pêşde bikeve, da ku hun bikanibin di pêkanîna kirinên me de roleke mestir bilîzin.

Jêr-koma me ya nuh a Perwerda kar ji nişteciyan pêk hatiye û yek ji Karmendên me yên Tevlêbûna Nişteciî dikane ji bo sehkirina pêwîstîyên we yên perwerdeyî û dîtina awayên bersîvkirina wan bibe alîkar.

Li gel Chris Bell, Karmendê Tevlêbûna Nişteciî li 020 8489 4436 têkilî çê bikin, an jî email bo chris.bell@homesforharingey.org

Me her weha dilxwazên bi hewes divê ku tev li Jêr-koma Perwerda kar bibin. Heke eleqa we li ser Perwerda Kar hebe û hun bixwazin zîrektîyên xwe û yên hevalên nişteciî pêşde bixin, ji kerema xwe li gel Chris Bell (wek li jor) têkilî çêbikin.

Karta Kirêya Xanî û Mesrefan

Du ji sê kirêdaran Karta xwe ya Kirêya Xanî û Mesrefan bikar fînin ku kirêya xwe bidin. Hun dikanin ji bo dayina kirêya xwe karta xwe li her cîhekî ku işareta PayPoint, PAYzoneTM, E-Pay, an Post Office® lê ye bikar bînin.

Divê bi vê hejmara Homes Zone re ji bo we **salname**yeke ji bo şopandina **dayinên we** hebe. Heke we ew nesitendibe, û ku hun yekê dixwazin, ji kerema xwe li gel Tîma Hesabên Kirê li 020 8489 3449 têkilî çêbikin.



Desteya we ya Birêvebir

60 sanîye bi … Michael Jones

Michael Jones yek ji pênc pisporên serbixwe yên di Desteya birêvebir a Homes for Haringey de ye. Vê nêzîkê wek serok hat tayînkirin.

Mike, tu wek serokê Homes for Haringey hatiyî hilbijartin. Şirîkeya nuh ê çi bike?

Homes for Haringey şirîkeyeke bi giştî aîdî Şaredarîya Haringey e. Şaredarîyê ji bo me du pêşanîyên sereke danîne. Ya yekê çêtirkirina xizmetên bo kirêdar û xwedî-lease'an e, da ku em bigihêjin standarda hikûmetê ya 'du stêrk'. Ya dudan, ku tenê heke em du stêrkan bistînin wê pêk bê, dê di standarda Xanîyên Minasib a hikûmetê de çêtirkirina xanîyên kirêdaran be.

Bidestxistina Xanîyên Minasib dê dawîya çîrokê be?

Na, ji bo çêtirkirina kalîteya jîyanê bo kirêdar û xwedî-lease'ên li sîteyên me, gelek xebatên ku bên kirin hene. Divê em bixebitin da ku sîte ewle bin, û ku em şêlên antî-sosyal têk bibin. Lê belê acizîyên piçûk jî bandûrê li jîyana mirovan dikin, wek çareserkirina gemar, grafîtî, û paqijîya sîteyên me jî dê girîng be.

Rola nişteciyan di gişta vê de çi ye?

Em bi hewes in ku bi nişteciyan re bixebitin, û bibihîzin ku kirêdar dixwazin em çi bikin. Nişteciî dikanin alîkarîya me bikin ku standardan pêk bînin û tev li çavdêrîya ku em xizmetan birêkûpêk dikin an na bibin. Civînên me ji gel re vekirî ne, û em bi hatina nişteciyan kêfxweş dibin.

Endama Desteya Birêvebirîya me ya herî nuh

Rosie Chapman nuha Dîroktora Polîtîka û Bibandûrbûnê ya Komîsyona Xêrxwazîyê ye.

Ew weha dibêje: "Ez ji 20 salan gelekî bêtir nişteciyên Haringey im. Ez bi rastî jî ji jîyana li vir hez dikim û dixwazim tecrube, zanîn û zîrektîyên xwe ji bo berjewendîya nişteciyan û herêma ku ez lê rûdinim bikar bînim – bi gotineke din tiştekî bi şûn ve bidim."

Rosie tev li 16 endamên din ên Desteya Birêvebir dibe, ku di nav de heft nişteciî hene û ji birêvebirina Homes for Haringey berpirsiyar in.

Zelal kirin

Di hejmara dawîn a Tenant Star de me wisa nivîsî: Krishna Sengupta (nişteciî) beşdarî Komela Xwedî-Lease'an a Haringey dibe.

Ne tîma edîtor ne jî Mrs Sengupta qest kir ku pozîsyoneke wê ya fermî di vê sazîyê de heye.

Lê belê, Komela Xwedî-Lease'an a Haringey (HLA) dixwaze zelal bike ku her çiqas Mrs Sengupta tev li civînên HLA dibe jî, wek her xwedî-lease'ekî li navçeyê tê vexwendin ku tev lê bibe, ew ne nûnera HLA an xwedî-lease'ên di Desteya Birêvebir de ye, ne jî tu têkilîya HLA bi hilbijartina wê bo Desteyê heye.

Rast kirin

Tîma edîtor lêborînê ji Jonathan Card, endamekî Desteya Birêvebirîya Homes for Haringey dixwaze. Di hejmara dawîn a Tenant Star de wêneyê ne rast hat bikaranîn. Wêneyê rast li vir e.

Banga we

Kirêdarek dipirse: 'Hemû beşdarîya kirêdaran bi ku ve diçe?'

Irene Barker tev li civînên Homes for Haringey ên pircûre dibe, lê belê his dike ku nêrîneke giştî li ser ku çi diqewime nastîne.

"Hejmarek Panelên Tevlêbûna Nişteçî hene, lê belê dema min tuneye ku tev li hemûyan bibim, ji lew re ez diçim ewên ku herî pir bala min dikişîne.

Wek encam, nêrîna min li ser ku li Homes for Haringey çi diqewime pir bi sînor e. Ez nizanim ku li hinek panelên din çi hatiye gotûbêj kirin. Îcar ez dikanim li ku bibînim ku li derên din çi diqewime? Hemû agahîya ku ji van koman tê li ku derê digihêje hev?

Ez his dikim ku divê nişteçî li ser ku wek encama şêwirdarîyê çi pêk hat bêtir agahî bi şûn ve bistîne. Ewên ku tev li kom û panelan dibin divê his bikin ku dem, hewldan û nêrînên wan ji bo tiştên baş tên bikaranîn.

Ez li gel im ku Homes for Haringey ji nişteçîyan dipirse ku xizmet dikanin çawa bên çêtirkirin, lê belê divê em bizanibin ku tişt li derekê dicivin û ji bo rêberîya me ya pêşedemê tên bikaranîn.

Homes for Haringey divê ji me re xuya bike ku em bi rastî pev re dixebitin – divê em bibînin ku tiştekî erênî pêk tê."

Bersîva Simon Godfrey, Menecerê Tevlêbûn û Komunîkasyonê, Homes for Haringey.

Irene mijareke pir baş bilêv dike. Gelek panelên nişteçîyan, komelên nişteçîyan, komên bikarhênerên taybetî û Foruma Şêwirdarîya ya Nişteçîyan hene, ji lew re em yekcar pir agahî didin hev.

Hun dikanin ji bo bidestxistina notan li ser înternetê forma di beşa 'tev lê bibe' ya websîteya me de tije bikin, an têkilî li gel tîma me ya Tevlêbûna Nişteçî li 020 8489 4463 çêbikin, an jî email bişînin: resident.involvement@homesforharingey.org

Bicîh bizanibin ku em agahîya ku hun ji bo alîkarîya çêtirkirina xizmetên me didin me li gora pêwîstîyên civaka herêmê bikar tînin. Em pêşketina ku em dikin di vê kovarê de û li websîteya xwe ji we re dibêjin.

Em dixwazin ji we bibihîzin

Tiştekî ku hun li ser Homes for Haringey bibêjin heye? Ji me re bibêjin.

Telefon: 020 8489 4487
Email: communications@homesforharingey.org
Binivîsin: Communications Team, Homes for Haringey,
13 - 27 Station Road, London N22 6UW

Em mafê redakte kirina nivîs, name û emailên ku em ji bo weşandinê distînin diparêzin. Mixabin em nikanin garantî bikin ku em ê hemûyan biweşînin.

Taybetmendî
Lêkolîna Nîştecî 2005/06
We ji bo me çi got …

Em dixwazin bizanibin ku hun li ser xizmetên ku em pêşkêş dikin çi difikirin, ji lew re her sal em ji nimûneyek kirêdar û xwedî-lease'an dixwazin ku ji me re bibêjin.

Ji Mijdara 2005an heta Çileyê Paşîn 2006an, MRUK, şirîkeyeke serbixwe a lêkolîna marketê li ser navê me lêkolînek pêk anî. Bi gişî bi 917 kirêdar û 400 xwedî-lease'an re hevpeyvîn çêkirin.

Hinek balkêşîyên ji lêkolînê ev in.

Em pev re xebatê dikin
Sala çûyî, me derfetên bo tevlêbûna nîştecîyan bo xebata Homes for Haringey zêde kirine. Lêkolînê dîyar kir ku ev guhertin bi dilê we ye.

%82ê kirêdaran û %63ê xwedî-lease'an his kir ku em haydarkirina wan ji tiştên ku dibe ku bandûrê li wan bikin baş birêve dibin.

Li dor du ji sisê nîştecîyan ji derfetên tevlêbûna birêvebirîyê û biryarên li ser malên wan xweş in. %78ê kirêdaran û %67ê xwedî-lease'an belê kir ku nêrînên wan li pêş çav tên girtin.

Kesên ku hevpeyvîn pê re çêbûn, komelên nîştecîyan, civînên sîteyan, panelên tamîran, gerên li sîteyan, panela tevlêbûna kirêdar û foruma xwedî-lease'an herî pir wek awayên îfadekirina nêrînên xwe jê haydar bûn.

Encam li gora sala çûyî çêtirkirinek e. Ev ji bo me nûçeyek baş e: ew xuya dike ku em li gotinên we guhdarî dikin û li gora wê tev digerin.

Em dixwazin ku bêtir kirêdar û xwedî-lease tev lê bibin ku ji me re bibe alîkar ku em çêtirkirina xizmetên xwe bidomînin. Ji bo bêtir agahîya li ser çalakîyên ku em pêşkêş dikin, ji kerema xwe li gel tîma Tevlêbûna Nîştecî têkilî çêbikin: 020 8489 4463.

Xizmetên tax û sîteya we
Piranîya kirêdar û xwedî-lease'an wek cîhekî lêmayinê ji taxa xwe xweş in (kirêdar %85, xwedî-lease %72).

Dema ku ji nîştecîyan problemên li taxê hatin pirsîn, ew herî pir li ser gemar û avêtîyên li cadê bi fikar bûn (kirêdar %20, xwedî-lease %12), dûre parkkirin tê (kirêdar %12, xwedî-lease %23), û firotina narkotîkan (kirêdar %12, xwedî-lease %20).

Me bi kêfxweşî bihîst ku %75ê kirêdaran û ji %50yê xwedî-lease'an his dikir ku em bi erebên terikandî, grafîtî û vandalîzmê mijûl dibin.

Lêkolînê xuya kir ku nîştecîyên ku xizmeteke konsîyerj distînin gelekî jê xweş in: %92ê kirêdaran, %74ê xwedî-lease'an xizmet bi gişî wek 'baş' nirxandin, û bêtir ji %90ê nîştecîyan karmend kibar û nazik dîtin. Xizmeta konsîyerj jî dibe alîkar ku serdanvanên nexwestî li derve bên hiştin.

%74
ê xwedî-lease'an his kir ku helwesta me baş e

%67
ê xwedî-lease'an belê kir ku nêrînên nîştecîyan li pêş çav tên girtin

%74
ê kirêdaran bi gişî ji xizmeta xwedîyê xanî xweş in

Xizmeta Tamîran
Hiştina mala we di rewşeke baş a tamîrê de bi qasî we ji bo me jî girîng e.

Hema hema du ji sisê kirêdaran ji tamîrên ku em bi giştî pêşkêş dikin xweş in. Çenekî bêtirî sê ji çaran his kir ku xizmeta ku em pêşkêş dikin hêja ye pereyê xwe.

Bêtir ji %90ê kirêdaran û %74ê xwedî-lease'an got ku şêlên karkerên me baş in: hejmarên wek wan his kir ku gemar û tevlihevî herî kêm tên hiştin. Hema hema her kesî da zanîn ku berî ku dest bi xebatê bikin karkeran nasnameyên xwe raber kirine.

Komunîkasyon
Me bi kêfxweşî dît ku bêtir ji %80ê nişstecîyên ku jê hatiye pirsîn hejmara dawî ya Tenant Start hatiye bîra wan û ku %81ê kirêdaran ji kovarê xweş bûn. Em hêvî dikin ku hun ê ji Homes Zone bêtir jî hez bikin.

Bi rastî, piranîya we ji weşanên me xweş in, lê belê em ê ji bo çêtirkirina wan xebatê bidomînin.

Dema ku hun bi me re têkilî çêdikin, %84ê kirêdaran û %64ê xwedî-lease'an his dikin ku karmend bi kibarî û nazikî bi wan mijûl dibin. Bêtirî du ji sê kirêdaran û nîvê xwedî-lease'ên hevpeyvînkirî got ku zanîn û alîkarîxwazîya karmendan 'baş' bûye.

%84
ê kirêdaran kibarî û nazikîya karmendan wek 'baş' nirxand

%92
kirêdaran xizmeta konsîyerj wek 'baş' nirxand

Em ê encaman çi bikin

Bê guman, dîtina ku hun ji bo xizmetên ku em pêşkêş dikin çi difikirin bi me pir balkêş tê, lê belê sedema sereke ya ku me ev lêkolîn pêk anî ew bû ku ji me re bibe alîkar ku em bêtir tiştan li ser we, mişterîyên me fahm bikin, û bibînin ku divê em li ku çêtir bikin.

Em ê nuha agahîyê bikar bînin ku balê li ser tiştên ku divê em çêtir bikin kom bikin û ku ji me re bibe alîkar ku em xizmetên ku pêwîstîyên civaka herêmê bersîv bikin pêşkêş bikin.

Em ê li ser tiştên ku em dikin tim agahîya nûjen bidin we.

Tevlêbûn

Tev lê bûn – çîroka nişteciyekî

Martin Laheen çar sal berê di nav civata xwe de dest bi tevlêbûnê kir, wê gavê bihîstibû ku hinek cîranên wî plan dikir ku komeleke nişteciyan damezirîne.

Ew weha dibêje: "Ez berê tev li qet tiştekî bi civakê têkildar nebûbûm, lê belê ev tiştek bû ku yekser bandûr li min dikir.

"Divê mirov li ser ku li dora wan çi diqewime berpirsiyarîyê hilgire. Bi tevlêbûnê îhtîmala sitendina xizmetên ku em dixwazin bêtir dibe.

"Nuha ez diçim gelek civînan. Ew pirê caran pir jîndar in û derfet bo herkesî çêdibe ku fikirên xwe bibêjin. Carinan mijarên ku em gotûbêj dikin ne pir bi heyecan in, lê belê ji bo rastkirina tiştan, ew pêwîst in.

"Dema ku ez tev li koma 'Compact' bûm, min bi rastî nizanîbû ku Compact çi ye. Nuha ez fahm dikim ku ew giştli ser pêkanîna çend qaydeyan e – heke nişteciî, şaredarî û Homes for Haringey ê wek tîmekê pev re xebatê bikin, ev girîng e.

"Dema ku em diqedînin, dokumenteke me çêdibe ku em giştli ser li hev dikin û di pêşedemê de dikanin wek referans bikar bînin.

"Ez ji bo Homes for Haringey pir bi heyecan im û dixwazim ku ew bimeşe. Heke bêtir nişteciî tev lê bibin, ew ê bibe alîkar ku sazî balê li ser tiştên ku ji bo civaka herêmê girîng in kom bike."

Xebat bi nişteciyan re da ku xizmetên xanî yên kalîte û xanîyên minasib bên pêşkêşkirin

Heke hun dixwazin tev lê bibin, lê nizanin ku ji kuderê dest pê bikin, têkilî li gel tîma Tevlêbûna Nişteciî ya Homes for Haringey li 020 8489 4463 çêbikin, an jî email bişînin resident.involvement@homesforharingey.org

Rola Panela Fînansê ya Nişteciyan

Panela Fînansê ya Nişteciyan li mijarên fînansê û nirx bo pere dinêre, û nêrînên nişteciyan li ser performans û planan digihîne şaredarî û Homes for Haringey.

Panelê vê nêzîkê zêdekirina kirê ya 2006an şîrove kiriye – bo şaredarî û hikûmetê – û guhertinên raporên kirê pêşniyar kirine. Ew her weha ji bo pêşanî dayina pêşçavkirina xizmetan li gora nirx bo pere bûye alîkar û li karmendên pêşniyarkirî bo Homes for Haringey nêrîye.

Panel ê di demeke kin de li plansazîya fînansê ya me û birêvebirîya budçeyê û ku em deynên xwe çawa baş kom dikin (wek yên kirê) binêre.

David Singh, serokê panelê û nişteciyekî Broadwater Farm weha got: "Panela Fînansê awayekî nuh ê tevlêbûna kirêdar û xwedî-lease'an e ku şaredarî û Homes for Haringey kirêyên me çawa serf dikin û em ê seh bikin ku em ji bo perê xwe xizmeta herî baş a mimkun bidest bixin."

Panela Fînansê her meh di Sêşema yekemîn seet di 19.00an de dicive. Em bi hatina hemû kirêdar û xwedî-lease'an kêfxweş dibin. Têkilî: Mark Smith li 020 8489 3989 an jî email: mark.smith@homesforharingey.org

Salnameya civînan

TÎRMEH	**Tarîx**	**cîh**	**dem**
Panela Fînansê	4 Tîrmeh	Civic Centre	19.00
Panela Xwedî-lease'an	6 Tîrmeh	Civic Centre	19.00
Panela Kirêdarî û Birêvebirîya Sîteyan	11 Tîrmeh	Civic Centre	19.00
TEBAX			
Panela Fînansê	1 Tebax	Civic Centre	19.00
Foruma Şêwirdarîyê ya Nişteçîyan	9 Tebax	Civic Centre	18.30
Panela Nişteçîyan a Tamîrê	17 Tebax	Civic Centre	19.00
ÎLON			
Panela Fînansê	5 Îlon	Civic Centre	19.00
Panela Xwedî-lease'an	6 Îlon	Civic Centre	19.00
Panela Kirêdarî û Birêvebirîya Sîteyan	12 Îlon	Civic Centre	19.00
PÊŞDE			
Foruma Şêwirdarîyê ya Nişteçîyan	4 Cotmeh	Civic Centre	18.30
Foruma Şêwirdarîyê ya Nişteçîyan	30 Mijdar	Civic Centre	18.30

Dibe ku em bikanibin mesrefên lênêrîna zarokan bidin û ji bo mirovên ku pêwîstîyên wan ên tevgerînê hene wesayîtan pêşkêş bikin.

Ji bo bêtir agahîyê, ji kerema xwe têkilî li gel tîma Tevlêbûna Nişteçî li 020 8489 4463 çêbikin an jî email bişînin bo: **resident.involvement@homesforharingey.org**

Rûpela Probleman a Pam

Pam awayên çareserîya problema qerebalixîya zêde pêşniyar dike

Ez ji malbatên ku di xanîyên pir qerebalix de rûdinin gelek nameyan distînim. Di bersîva min a nameya ku îro tê dayin de, ez li hinek awayên din dinêrim ku dibe ku Homes for Haringey an Şaredarîya Haringey bikanibe alîkarîyê bike.

Merheba Pam,

Ez û mêrê xwe teva 3 keçên xwe yên 18, 8 û 6 salî di daîreyeke bi 2 odên xewê de dimînin. Keça min a 18 salî xwendekara dîzayna modayê ya BTEC ye, ew heta derengê şevê kar û xebata dersê dike, û êvaran hevalên wê tên ku pev re li muzîkê guhdarî bikin û sohbet bikin – wek ku ciwan dikin. Ew makîneke dirûnê bikar tîne ku pir bi deng e, lê ji bo karê koleja wê pêwîst e. Ji ber vê yekê, me oda xewê ya herî piçûk daye wê. Ev dike ku ez û mêrê xwe odeyeke xewê bi keçikên xwe yên piçûk re parve bikin. Ji ber ku di odê dê cîh bi sînor e, ez û mêrê xwe li erdê li nivînekî bi betanîyan radikevin û ji bo her keçikekê nivînekî yekane heye. Ji me kesekî re mehremîyet tune û qet cîh tuneye ku keçik tê de bilîzin.

Ev şeş sal in ku ez li cîhekî pev guherînê digerim – ji bûyina piçûka me û vir de – lê qet derfetek çênebû. Ez di nav lîsta transferê ya xanî de me, lê belê ji me re gotine ku hema hema qet îhtîmala daîreyeke mestir tuneye. Ez dizanim ku mirovên ku di rewşên ji ya me xerabtir de dimînin jî hene, lê belê ez his dikim ku ji ber ku em her du jî dixebitin, baca beledîya xwe ya mehê £160 û kirêya xwe ya heftê £71 didin, divê derfetên barkirinekê ji bo me hebin. Em qet alîkarîyên sosyalê nastînin û kirêya xwe di demê de didin. Ez ê bi hin temîyan gelekî sipasdar bim. Em li ser kirîna daîreya xwe fikirîn, lê bi £203,000an gelekî li ser bihayê xwe bû.

Sipas

Xanim M

Bêtir agahî

Pev guherîn

Pevguherîn ji bo kirêdarên ku dipên ku bi kirêdarekî din ê Haringey, an şaredarîyeke din an jî komeleke xanîyan ên li Brîtanya li derekê dimînin re xanî pev biguherînin e. Divê her du xwedîyên xanî jî pevguherînê belê bikin.

Heke deynê we yê kirê hebe, îhtîmala ku pevguherîna we bê belêkirin pir kêm e.

Bêtir agahî:

Ji navenda mişterî ya herêma xwe formeke Xanî pevguherînê (Homeswap) bixwazin. Hun dikanin kitkitên hemû navendên me yên mişterî li rûpel 15 ê Homes Zone bibînin.

(di rûpelê dû wê de didome)

Bersîva Pam...

Xanima Birêz M,

Xuya dibe ku malbata we di jîyana li daîra we di dijwarîyê de ye. Lê belê wek ku hun dibêjin, hejmareke mezin malbat hene ku li xanîyên qerebalix rûdinin; ji ber vê yekê tenê di rewşên yekcar xerab de xanî guherandina wan mimkun dibe.

Her weha li gora qanûna bixanîkirinê, dema ku nirxanidina malekê wek ku zêde qerebalix e an na tê kirin, oda rûniştinê jî wek odeyeke xewê tê hesibandin; ji lew re malbata we ji alîyê qanûnê ve wek zêde qerebalix nayê hesibandin.

Hun dibêjin ku di pevguherîna xanî de hun bi ser neketine. Ofîsa xanîyê we lîsteke pevguherîna herêmî ji bo kirêdaran heye û kitkitên we lê hatine zêdekirin. Heke partnerekî pevguherînê yê minasib tev li lîstê bibe, menecerê we yê xanî dê bi we re têkeve têkilîyê.

Awayekî din ku Şaredarîya Haringey bikanibe alîkarîya we bike ew e ku keça we ji bo daîrekê bi xwe serîlêdanê bike. Li her rewşê cîhê tê nêrîn, ji lew re ez nikanim bibêjim ku ew ê biser keve an na.

Heke keça we naxwaze ji we cîhê bibe û ku hun dixwazin malbatê bi hev re bihêlin, hun dikanin li ser xwedîtîya hevpar bifikirin, ji ber ku hem hun hem jî mêrê we dixebitin.

Xwedîtîya hevpar alîkarîya mirovan dike ku bikanibin xanîyekî bikirin. Mirov dikanin pareke xanîyekî bikirin û ji bo yê mayî ku ne aîdî wan e kirê bidin. Serîlêdêr dikanin pêde pêde bêtir par bikirin û di dawîyê de bibin xwedîyê xanîyê xwe.

Hejmarek xanîyên nuh ên Haringey hene ku komelên xanî ava kirine ku bi awayê xwedîtîya hevpar bên kirîn. Piranîya van xanîyan li Haringey in, lê belê hinek xanîyên firotinê hene ku li navçeyên din in, wek Barnet, Camden, Islington, Westminster û Enfield.

Ez hêvî dikim ku ev bûbe alîkar. Heke hun di dîtina çareserîyeke bo rewşa malbata xwe de biser kevin, ji kerema xwe haya min jê çêbikin.

Pam

(Continued)

Serîlêdana xanîyekî

Xizmetên xanî yên şaredarîya Haringey dikanin şêwirdarîya xanî pêşkêş bikin.

Bêtir agahî:

Websîteya Şaredarîya Haringey: www.haringey.gov.uk

Tîma Şêwirdarîya Xanî: 020 8489 4309

Navenda xizmeta mişterî ya herêma we

Xwedîtîya hevpar – Çawa dixebite

Proje dihêle ku hun pareke xanîyekî ji xwedîyekî xanî yê civakî bikirin, pirê caran ji komeleke xanîyan. Divê hun bi rêya banke an bankeke kooperatîfê mortgage bistînin ku para xwe bikirin. Hun para mayî ku ne ya we ye ji xwedîyê xanî yê civakî kirê dikin.

Bêtir agahî:

Websîteya Şaredarîya Haringey: www.haringey.gov.uk

Tîma Stratejîya Xanî:

020 8489 4721

û bêtir

Peymana me ya Mişterî

Ji bo Homes for Haringey girîng e ku ji mişterîyên me re xizmeteke baş pêşkêş bike. Ji bo bi awayekî minasib kirina vê divê em bi kirêdar û xwedî-lease'an re bi awayekî zelal û hevgirtî xebatê bikin.

Ji bo ku ji me re bibe alîkar, me Peymana Mişterî ya Homes for Haringey pêk anîye ku dahîne pêş ku em çi ji hev hêvî dikin.

Me ev rêza standardan bi şêwirdarîya karmendên Homes for Haringey û nişteciyên ku tev li civînan bûne pêk anîne, wek Foruma Şêwirdarîya Nişteciyan û komên Tirkî û Somalî-axêv.

Dilxweşî ew bû ku şûnve agahîya karmend û mişterîyan pir nêzîkî hev bûn. Ev xuya dike ku em pir nêzîkî hev difikirin. Ji bo her kesî girîng bû ku divê ev peymaneke du-alî be.

Bi kurtî, Peymana Mişterî dibêje ku Homes for Haringey ê xizmeteke dostane û profesyonel a li gora pêwîstîyên we pêşkêş bike, û we agahdar bike. Li hemberî wê, mişterî yê li gora peymana xwe ya kirêdarîyê tev bigerin, tevlêbûnê bikin û bi şûn ve agahîyê bidin me. Ya herî girîng, karmend û mişterî yê bi rûmet û hurmet bi hev mijûl bibin.

Em his dikin ku Peymana Mişterî ya me dokumenteke watedar e û em wê dikin navenda têkilîyên me û we. Em bawer dikin ku ew ê alîkarîya me bike ku em pev re çêtir bixebitin, û em hêvî dikin ku hun jî weha bawer dikin.

Hun dikanin kopîyeke peymanê ji websîteya me peyde bikin, www.homesforharingey.org an jî navendên me yên xizmeta mişterî.

fîşeke £50 qezenc bikin

Li Broadwater Farm rûdinin?

Hez dikin ku fîşeke kirînê ya **£50** qezenc bikin?

Di 18 mehên çûyî de, hemû yelpazeya Xizmetên Mişterî rojên Sêşem û Pêncşemê piştî nîvroj li Ofîsa Taxê ya Broadwater Farm Neighbourhood Office amade bûne.

Ji bo alîkarîya me ku em bizanibin ku nişteciî dixwazin ku ev xizmet bidome an na, hemû malên li Farm dê pirsnameyekê bistînin. Em dixwazin ku hun wê tije bikin û ji me re bibêjin ku hun çi difikirin.

Kopîya xwe ya pirsnameyê bipên û gotina xwe bibêjin. Dibe ku hun yek ji du nişteciyên bişans bin ku wê fîşeke kirînê ya £50an qezenc bikin!

A–Z
têkilîyên kêrhatî

Ji bo lêpirsînên li ser xizmetê Homes for Haringey tamîr jî di nav de telefon bikin bo **0800 195 3404**
Mînîkom: 020 8489 2088

Duşem:	8.00 – 18.00
Sêşem:	8.00 – 20.00
Çarşem:	8.00 – 20.00
Pêncşem:	8.00 – 20.00
Înî:	8.00 – 18.00

Tamîrên acil (dervê seetên xebatê) **020 8348 3148**

Raporkirina erebên berdayî
0845 073 6904

Şêlên Antî-sosyal
0845 671 1177

Alîkarîyên Sosyalê
0845 071 2800

Buroya Şêwirdarîya Hemwelatîyan
0870 126 4030
www.adviceguide.org.uk

Baca Beledîyê
0845 073 3557

Rawestkarên Sûc
All calls are anonymous
0800 555 111

Xeta germ a Grafitî
0845 073 1979

Şaredarîya Haringey
020 8489 0000

Tîma Xwedîtîya Xanî 1
020 8489 3048
(ji bo lêprisînên xwedî-lease li ser xanîyên li Hornsey, Broadwater Farm û North Tottenham)

Tîma Xwedîtîya Xanî 2
020 8489 5996
(for leasehold enquiries about homes in South Tottenham and Wood Green)

Tîma Firotinên Xanî 020 8489 3357

Şêwirdarîya bêxanîbûn û xanî
0845 076 2700

Alîkarîya Kirêya Xanî û Baca Beledîyê
0845 071 2800

Xizmetên Demxweşîyê (leisure)
020 8489 5396

Xeta Parkkirinê
0845 073 1234

Îstasyonên Polîsan (herêmî)
0208 808 1212

Tîma Tevlêbûna Nişteçî
020 8489 4463
resident.involvement@
homesforharingey.org

Gemar û Avêtî
020 8885 7700

Tamîrên xanîyên sitargeh
020 8489 8693

Xanîyên bi Pişteyanî
020 8489 2367

Navendên Xizmetên Mişterî
Duşem – Înî, 8.00 – 18.00 vekirî

Hornsey
Broadway Annexe
Hornsey Town Hall
Crouch End, N8 9JJ

North Tottenham
639 High Road
Tottenham, N17 8BD

South Tottenham
(li kêleka îstasyona metro ya Seven Sisters) Apex House
820 Seven Sisters Road
Tottenham, N15 5PQ

Wood Green
48 Station Road
Wood Green, N22 7T

Ofisên Xanî
Tenê bi randevû.

Ofisa Taxê ya Broadwater Farm
108c Gloucester Road
Tottenham, N17 6GZ
9.00 -12.00 û 14.00 - 16.45,
Duşem, Sêşem û Pêncşem
17.00 – 19.00, Çarşem
9.00 -12.00, Înî

Hornsey
Hornsey Town Hall
The Broadway
Crouch End, N8 9JJ

North Tottenham
782 High Road
Tottenham, N17 0BX

South Tottenham
(li kêleka îstasyona metro ya Seven Sisters)
Apex House
820 Seven Sisters Road
Tottenham, N15 5PQ

Wood Green
13-27 Station Road
Wood Green, N22 6UW